

## Ji bo dêûbavên zarokên wan diçin kreşên Berlinê

10ê Hezîrana 2020an

### Agahiyên ji bo dêûbavan li ser pergala kreşan ya di Hezîrana 2020an de vedigere ser xebata ji rêzê

Stî û mîrzayên rêzdar,  
dêûbavên hêja,

girtina kreşên li Berlinê ya ji 17ê Adara 2020an ve ji bo we û zarokên we di jiyana rojane de bû sedema zehmetî û astengiyên mezin. Zarok bêriya hevalên xwe û xizmeta pêbawer ya kreşê dikin, dêûbav bêriya piştgiriya dikin, ku bikaribin malbat û karê xwe li gel hev bimeşînin.

Her çiqas xebata acîl a li navendan di hefteyên dawî de bi piştgiriya hêlînan her û her dikaribû were berfirehkirin, ku bi vê re di nav demê de bêhtirî nivê zarokên beriya krîzê dihatin hêlînê niha di çarçoweya lênêrîna acîl de xizmetê dibînin, lê belê dîsa jî rewşa niha ya lênêrîna zarokan ne bi dilê gelek ji we ye.

Li gorî pêkhatinên kêrmanî yên enfeksiyonê û pê re jî sistkirinên curbicur yên tedbîrên kêmkirina şewbê di tevahiya beşên jiyana de, em dixwazin êdî hêlînên zarokan ên rojê yên li Berlinê dîsa vekin û derbasî xebata kreşê ya asayî bibin.

Ji bo vê ev gav hatine plankirin:

- Piştî duşemê, **15.06.2020** hete duşemê, 22.06.2020, divê tevahiya zarokên hete niha di çarçoweya lênêrîna acîl de xizmet nedîtine, li gorî mafê xwe ji aliyê hêlîn û navendan ve werin qebûlkin.
- Herî dereng piştî **22.06.2020** divê tevahiya zarokan xizmeta lênêrînê di **dorfirehiya kûpona şexsî de** bigirin. Ev yek her wisa pêşkêşkirina xebata zû û dereng ya di çarçoweya demên vekirî de diafirîne. Piştî niha lîsteya komên pişeyên di fermiyetê de bi sîstemê ve girêdayî êdî betal dibin.
- Dem-çarçoweya **di navbera 22.06.2020 û 31.07.2020an de** divê bibe alîkar, da ku xebata lênêrîna zarokan were zexmkirin û **amadekariya sala nû ya kreşê 2020/2021** ya piştî 01.08.2020an were kirin, bo nîmûne ev dem divê ji bo qeydiya zarokên nû û hînkirina wan ya hêlînê were bikaranîn.

Di encama vê pêvajoyê de tevahiya zarokan xizmeta lênêrînê digirin. Ev yek dê ji bo malbatan bibe rehetiyêke mezin. Ji kerema xwe re hay jê hebin, ku bi destpêka xebata asayî mecbûriyetek çêdibe, ango divê hûn dîsa beşek ji mesrefên xwarinê bidin. Heke hûn herî deren hete 20ê Hezîranê dîsa mafê xwe yê lênêrîna zarokan bi cî binin, divê hûn heqê mesrefê ya bi qasî 23 € ji bo meha Hezîranê bidin. **Piştî Temûza 2020an ev peywirdarî ji bo tevahiya dêûbavan derbas dibe.**

Ji ber ku pandemî neqediya, vegera bo xebata asayî ya kreşê bi şertên taybet dimeşe. Bi qasî ku pêkan e divê lênêrîna zarokan bi şewaza komên sabît were pêşkêşkirin û paşê tesbîtkirina enfeksiyonan pêkan be. Her wisa tedbîrên kêmkirina têkiliyan ya di navbera dêûbav û kreşê de wekî berê girîng e:

- Di dema anîn û birina zarokan de divê bi qasî, ku ji destê we tê têkiliyên we yên bi hev re kêmbin (di navbera xebatkar û dêûbavan de, di navbera dêûbavan de). Ji bo vê yekê dibe ku demên cudakirî yan jî teslîmkirina li derve kêrhatî bin. Li gorî vê yekê gava hûn zarokê xwe binin û bibin, divê hûn dev û pozê xwe bipêçin.
- Divê axaftinên dêûbavan hêj jî zêdetir bi riya telefonê bimeşin. Di têkiliyên rasterast de divê tedbîrên her car yên li gorî rêbazan (pêçandina dev û poz, mesafe) werin standin.

Bicîanîna rêbazên mesafeyê yên di lênêrîna zarokan de êdî ne pêkan e.

Pêvajoya vekirina hêlînan dê ji bo sazî û navendan zehmetiyên mezin yên rêxistinîkirinê biafirîne, bi taybet ji ber ku niha ne tevahiya lênêran dikarin bixebitin.

Ji ber vê yekê em ji we rica dikin, ku hûn di derbarê sazîkirina diyar ya lênêrîna zarokan de bi navendên xwe re bi awayekî rêk û pêkî bidin û bistînin û bi hev re li çareyan bigerin, ku ji bo her du aliyan pêkan in û dikarin bi cî werin. Tenê bi riya piştgiriya hev ya berdeyamî em dikarin vê pêvajoya vekirina hêlînan pêk binin.

Ez piştrast dikim: Ev encam me tevan digihîne hev, ku em rewşa lênêrîna zarokan ji bo malbatên berlinî li gorî rewşa niha hete ji destê me tê baş û zû çêtir bikin.

Telefona acîl ya Rêveberiya Senatoyê ji bo dêûbavan **(030 90227 6600)** hete 30.06.2020 ji bo we di xizmetê de ye.

Li gel silavên germ

Peywirdar

Schulze